Hejmara - 197

Bê dirave

# MIZGÎN

15 - Berfanbar - 2025



# Naverok


1 Wênesazî

2 Wêjeya Zarokan

3 Lîsk

4 Welatê me

5 Tu dizanî

6 Tendirustî

7 Tîp û gotin

8 Navdar

9 Bexçeyê Navan

10 Jîngeh mala me ye

11 Jêhatiyên Zarokan

12 çîrok

16 Bixwînin û fêr bibin

17 Çavika Mizgîn



Amadekirina Naverokê
Amir Ferso

Şêwekar
Umer Ishaq
Xalid Bîco
Baran zagros

Rojhilat

Dîzayn
Mecid Alsadûn

Sererastkirina Kurdî
Mihemed Xanim


Sererastkirina Erebî
Abdulah Rehîl

Kovara Mazgîn

Kovara Mazgîn مجلة مزكين

## Ji bo xêzkirina panda gavên li jêr bişopîne

## اِتبَعِ الخَطوَاتِ التَّالية لِرَسْمِ الباندا



# PÎRÊ

*Pîrê pîra didanhûr*
*Nan datîne binê tûr*
*Dema saet dibe neh*
*Riya kalo dide şeh*
*Pîrê pîra ehnîxîz*
*Rûn datîne binê dîz*
*Qelyê têxe binê kûz*
*Heban tijî beyv û gûz*
*Nîvişk digre ji meşkê*
*Dew dertînee ji keşkê*
*Pîrê pîra serkofî*
*Benika dike girofî*
*Ji bo kalo dirêse*
*Şîva pîrê helîse*
*Pîrê pîra dilkovan*
*Ji bo kalo dilovan*




Diyar Bohtî

Hejmarên guncav bixin nava valahiyên kesk; Ji bo ku hûn di valahiyên zer de encama rast bidest bixin.

**ضَعِ الأرقامَ المناسبةَ في المربَّعِ الأخضرِ؛ لتحصلَ عَلى النتيجةِ الصَّحيحةِ في المربَّعِ الأَصفرِ.**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| | = | 2 | - | 5 |
| + | | - | | + |
| 2 | = | | + | |
| = | | = | | = |
| | = | 1 | - | 6 |







# Keleha Amediyê

# قلعةُ العَماديَّةِ

Li Başûrê Kurdistanê, Keleha Amediyê li ser cihekî bilind e ku li ser geliyên xweşik dinêre. Mirov bi hezaran sal in li vir dijîn û dîroka wê vedigere 2 hezar sal berî zayînê an jî zêdetir.

Keleh navendeke bajarvanî û çandî bû û di dîroka Kurdan de roleke girîng lîstiye; ew beşek ji mîrneşîna Bahdînan bû ku bi sedsalan li herêmê desthialtdarî kir, gelên Kurdistanê hîn jî di dîroka xwe de cihê wê bi bîr tînin.

Li ber deriyê bajarê kevin, em dikarin deriyekî kevirî yê kevnar û pêpelokan bibînin, ew çîrokên kesên ku bi sedsalan berê li ser wan meşiyane vedibêjin. Herwiha Amediyê abîdeyên wekî minare û avahiyên kevnar jî dihewîne ku serdemên cûda yên dîroka herêmê tînin bîra me.

في باشورَ كردستانَ تقعُ قلعةُ العماديَّة (أميدي) على هضبةٍ عاليةٍ، وتُطلُّ على وديانٍ جميلةٍ، عاشَ النَّاسُ هنا منذُ آلافِ السِّنينِ، تعودُ بألفي سنةٍ قبلَ الميلادِ أو أكثرَ.

القلعةُ كانت مركزًا حضريًا وثقافيًا، ولها دورٌ بارزٌ في تاريخِ الكُردِ؛ فقد كانت جزءا من إمارة بَهدِنانَ، التي حكمَت المنطقةَ لقرونٍ، وما زالَ أهلُ كردستانَ، يتذكّرون مكانتَها في تاريخِهِم.

يمكُننا أنْ نُشاهدَ عندَ مدخلِ المدينةِ القديمةِ بوابةً حجريَّةً قديمةً وسلالمَ تحكي قصصًا لمَن سارَ عليها قبلَ قرونٍ. كما توجدُ في أميدي آثارٌ، مثلَ، المآذنِ، والعمائرِ القديمةِ، التي تذكّرنا بعصورٍ مختلفةٍ من تاريخِ المنطقةِ.





# Tu dizanî?


# هل تعلم؟

## Pnada

We qet bihîstiye ku hirçek heye ji xwarina xêzeran hez dike zêdetir ji ya hingiv?
Ew hirç panda ye, xwediya piçra reş û spî ye, herwiha çavên wê wekî ku du berçavkên reş li ser bin, xuya dikin.
Ew li çiyayên Çînê dijî. Li wir darên bilind û mij xweşik in. Ew ji bêdengiyê hez dike û ji qerebalixê hez nake, ji ber vê yekê ew piraniya roja xwe bi xwarin an razanê derbas dike!
Tu dizanî ku dema panda kefxweş be ew dixwaze xwe bigindirîne?
Hevalên min ên biçûk hewil bidin ku hûn panda xêz bikin.

## البَاندا

هلْ سَمعْتَ من قبلُ عن دبٍّ يُحِبُّ أكلَ الخيزرانِ أكثرَ منْ العَسل؟
هوَ دُبُّ الباندا، صاحبُ الفِراءِ الأبيض والأسودِ، وعيناهُ كأنَّ عليهما نظارتَانِ سوداوان.
يعيشُ في جبالِ الصِّين، فالأشجارُ العَالية، والضَّبابُ الجميلُ. يُحبُّ الهُدوءَ، ولا يُحبُّ الضَّجيجَ، لذلك يقضي معظمَ يومِهِ، وهو يأكلُ أو ينامُ!
ولكنْ، هلْ تعلمُ، أنَّ الباندا يُحبُّ أن يتدحرجَ على الأرضِ عندما يكونُ سعيدًا؟
أصدقائِي الصِّغارَ، حاولوا أنْ تُرسموا دبَّ الباندا.



# Vexwardeyên germ

**Bi hatina payîzê re, avhewa hêdî hêdî sar dibe. Hevalên min, ma hûn dizanin ku vexwarina teravên germ di vê demsalê de ji bo laş pir sûdmend e?**
**Vexwardeyên germ ên wekî çaya bi gihayan an bi zencebîlê, an bi gulên kovî dibe alîkar ku laş ji hundir ve germ bibe û hestek rehetiyê peyda bike, heta di rojên sar de jî.**
**Keldûmana ji peyalê derdikeve alîkariya paqijkirina poz û qirikê dike, herwiha sermayê û kuxikê sivik dike.**
**Teravên germ laş şilek dihêle, ji ber ku em carinan di hewaya sar de vexwarina avê ji bîr dikin, ji ber vê yekê ev şilek cihê kêmasiya avê di laş de dadigre.**
**Ji bîr nekin hevalên Mizgîn: Dema ku hûn peyalekê ji vexwardeya xwe ya germ vedixwin, hûn di seranserê payîzê de laşê xwe germ û parastî dihêlin.**




# المشروباتُ السَّاخنةُ

مع حُلولِ الخريف، يبرُدُ الجوُّ شيئًا فشيئًا، فهلْ تعلمونَ يا أصدقَائِي أنَّ شُربَ السَّوائلِ السَّاخنةِ في هذا الفصلِ مفيدٌ جدًّا للجسمِ؟
- المشروباتُ السَّاخنةُ مثلَ الشَّاي بالأعشاب أو الزَّنجبيل، أو الزُّهور البريَّة، تساعدُ على تدفئَةِ الجسمِ مِن الدَّاخلِ، والشُّعورِ بالرَّاحةِ، حتَّى في الأيَّامِ البَاردة.
- البخارُ الصَّاعدُ من الكوب، يساعدُ على تنظيفِ الأنفِ والحَلقِ، ويُخفِّفُ مِن الزُّكامِ، والسُّعالِ في فصلِ الخريفِ.
- السَّوائلُ السَّاخنةُ تُبقي الجسمَ رطبًا؛ لأنَّنا أحيانًا ننسى شُربَ الماءِ في الجوِّ البارد، فتكونُ هذهِ السَّوائلُ عوَضًا عَن نقصِ الماءِ في الجِسمِ.
تذكَّروا يا أصدقاء مزكين:
عندما تشربونَ كوبًا مِن مشروبِكم السَّاخنِ، فأنتُم تُعطونَ أجسامَكم دفئًا وحمايةً طوالَ الخريفِ.






## أصْدقائِي الأعزاءَ، أكملُوا الحَروفَ النَّاقِصةَ؛ لتُكملوا الأسماءَ حَسَبَ صُوَرِها.





# Wêjevan Celal Zenkabadî

Hevalên zarok, werin em mirovekî ku ji gotin û çîrokan hez dikir, nas bikin. Navê wî Celal Zenkabadî ye. Ew di sala 1951'an de li Başûrê Kurdistanê ji dayik bûye û ji temenê xwe yê biçûk ve ji xwendin û lêgerîna çîrokên xweş, hez dikir.

Celal mezin bû û bû nivîskar, helbestvan, wergervan û lêkolîner. Wî bi Erebî û Kurdî nivîsand, pirtûk û helbest ji zimanên wekî Farisî, Îngilîzî, Spanî û Tirkî wergerand da ku wêjeyê nêzîkî xwendevanên zimanê xwe bike.

Wî gelek pirtûk û lêkolîn nivîsandine û di nav berhemên wî yên herî navdar de "Meosûet Al- Xeyam" û pirtûkên din ên ku li ser dîrok û çanda Kurdan in. Wêjevan Celal Zenkabadî di sala 2023'an de koça dawî kir, lê gotin û pirtûkên wî ji bo nifşên ciwan û bi temen, dimînin rêber.

# الأديب جلال زنكابادي

يا أصدقائِي الصَّغارَ، تعالَوا نتعرّفْ على رجل أحبَّ الكلماتِ والقصصَ، اسمُه جلال زنكَابادي. وُلدَ في باشور كُردستان سِنة 1951، ومنذ صغره أحبّ القراءةَ والبحثَ عن الحكاياتِ الجميلةِ.

كبُر جلال وصار كاتبًا، وشاعرًا، ومترجِمًا، وباحثًا. كان يكتبُ العربيَّةَ والكرديَّة، كما ترجمَ كتبًا وأشعارًا من لغاتٍ مثل الفارسيَّةِ، والإنجليزيَّة، والإسبانيَّة، والتُّركيَّةِ، ليقرِّبَ الأدبَ إلى قرّاءِ لغتهِ.

كتبَ الكثيرَ من المؤلَّفاتِ والدِّراساتِ، ومنْ أشهرِ أعمالِهِ «موسوعة الخيام» وغيرُها من الكَتبِ، التي تهتمُّ بتاريخِ وثقافةِ الكردِ.

غادرنا الأديبُ جلال زنكابادي سنة 2023، لكنّ كلماتِه وكتبَه تبقى مرشدةً للأجيالِ الصَّغيرةِ والكبيرةِ.

# Hin Navên bi tîpa - H

Hevrîn

Heval

Herdem

Hêlîn

Hêvîdar

Horî

# Bayê payîzê yê xweş

Te qet hest bi bayê payîzê kiriye ku li rûyê te dide?
Bayê vê demsalê ne tenê hewaye tevdigere, lê ew di heman demê de ji bo jîngehê jî doste û sûdên ku em nabînin pêşkêşî me dike.
Ew tovên şînatiyan belav dike da ku darên nû li deverên din şîn bibin, mîna ku dibêje: "Werin! Werin em jiyanê ji nû ve biçînin!"
Dema pelên hişk diweşin, ba wan li ser rûyê erdê kom dike da ku bihelin û bibin xwarin ji bo axê, da ku di bihara pêş de şînatiyeke nû şîn bibe.
Ba ewran li ezman kom dike, ji ber vê yekê ew kom dibin û li deverên cûda baranê dibarînin, herwiha zevî şîn dibin û erd şa dibe!
Hevalên min, ba hevala xwezayê ye, bi bêdengî dixebite da ku gerstêrka me xweşik û nû bike.



# رِياحُ الخَريفِ العَليلةُ

هل شعرتَ يومًا بنسيمِ الخريفِ، وهو يداعبُ وجهَكَ؟
الرِّياحُ في هذا الفصلِ، ليستْ هواءً يتحرّكُ، بل صديقةً للبيئةِ تقدِّمُ لنا منافعَ لا نَراهَا.
- فهيَ تنثُرُ بُذورَ النَّباتَاتِ؛ كي تُنْبتَ أشجاراً جديدةً في أماكنَ أخرى، كأنَّها تقولُ: "هيَّا! لنزرعِ الحياةَ من جديدٍ!"
- عندما تتساقطُ الأوراقُ الجافَّةُ، تجمعُها الرِّياحُ على سطعِ الأرضِ؛ لتتحلّلَ، وتتحوّلَ إلى غذاءِ للتُّربَةِ، فينبُتُ نبتٌ جديدٌ في الرَّبيعِ القادمِ.
- الرِّياحُ تجمعُ الغُيومَ في السَّماءِ، فتتكثَّفُ وتُسقطَ الأمطارَ في أماكنَ مختلفةٍ، فتنمو الحقولُ وتفرحُ الأرضُ!
فالرِّياحُ، يا أصدقائِي، صديقةُ الطَّبيعةِ، تعملُ بصمتٍ؛ فتَجعلَ كوكبنَا جميلًا ومتجدّدًا.

# Ednan Mutesim Lêl

**Ew 11 salî ye û di refa şeşan de dixwîne. Xwendekarekî biçûk e, bi enerjî û afrîneriyê dagirtiye! Ji hobiyên wî yên gelek: Goga piyan, avjenî, stranbêjî û wênesazî. Lê avjenî bû hewesa wî, bi saya bavî wî ku gelek caran ew bi xwe re dibir avjeniyê û ew teşwîq dikir. Adnan xwedî aliyekî hunerî yê pir baş e; Ew ji stranbêjî û muzîkê jî hez dike. Wî di çarçoveya projeya GAV2 de beşdarî Koma Koral bû û bi çar zimanan stran gotin! Ev yek jî bi teşwîqa mamosteyê wî yê li peymangeha "Artîst" pêk hat.**

**Ji ber ku huner di dilê wî de ye, Adnan di çarçoveya projeya GAV2 de tabloyek hunerî xêz kir, da ku bibe gaveke yekem ber bi xewna wî di cîhana afirînerî û hunerê de.**

**Lê xewna wî ya mezin ew e ku bibe endezyarekî mekanîkê, ji ber ku ew ji otomobîlan hez dike û evîndarê her tiştê ku bi wan ve girêdayî ye.**



# عدنان معتصم ليل

يبلِغُ مِنَ العُمْرِ 11 عامًا يَدْرسُ فِي الصَّفِّ السَّادِسِ، تلميذٌ صَغِيرٌ مَليءٌ بِالحيوِيَّةِ والإبْداعِ!

من بينِ هِواياتهِ العديدَةِ: كُرَةُ القَدمِ، السِّباحَةُ، الغِناءُ، والرَّسمُ. أمَّا السِّباحةُ، فَقدْ أَصْبحَ شغفًا لَهُ، بِفضْلِ تَشْجيعِ وَالِدهِ الَّذِي كَانَ يُصْطحِبهُ إِلى المَسْبحِ مَرَّاتٍ عَديدةٍ.

ولِعدنان جَانبٌ فَنّيٌّ رَائعٌ أيضًا، فهُوَ يُحبُّ الغِناءَ والمُوسيقَى. لقدْ شَاركَ فِي فِرْقةِ كُورَالٍ ضِمْنَ مَشْروعِ GAV2، وغَنَّى بِأربعِ لُغاتٍ مُختلفةٍ! بتشجيعٍ مِن أُستاذهُ فِي مَعهدِ "آرْتيست".

ولأَنَّ الفَنَّ يَسكنُ قَلبهُ، رَسمَ عدنان لَوْحةً فَنيةً ضِمْنَ مَشروعِ GAV2، لِتكونَ خُطوةً أُولَى نَحو حِلمهِ فِي عَالمِ الإبْداعِ والفنِّ.

أَمَّا حُلمهُ الكَبيرُ فَهوَ أَنْ يُصبحَ مُهنْدسًا مِيكانيكيًّا، لِأنَّهُ يُحبُّ السَّياراتِ ويَعْشقُ كُلَّ مَا يَتعلَّقُ بِهَا مِن قُوةٍ وجَمالٍ وإتْقانٍ.


# Çîroka : Girava hestan




Dibe ku girav me hîs dike û rewşa me daşopîn e
Ew bi min re têkilî datîne û enerjiya min hîs dike.


Bihêlin ez tiştekî biceribînim... Aramî... Ponijandin
Belê...Ew hestên me nîşan dide... Mîna neynikeke mezin... An jî dilek mezin
Binêrin, niha ew bû kirêt!
Werin em li şûna acizbûnê bi hev re bikenin.


Dayê dayê lê dayê
Dilovanê hêjayê
Şîr û vîyan te da min
Hejandî landika min
Girav waneyekê dide me, hestên me cîhana li dora me reng dike.
Ew bi şêwazê xwe xatirxwestinê ji me dixwaze.




Pisîk

قِطَّةٌ

ܩܛܐ (قاطو)

Cat




Hesp

حِصَانٌ

ܣܘܣܝܐ (سوسيو)

Horse




Çêlek

بَقَرَةٌ

ܬܘܪܬܐ (تورتو)

Cow



Kûçik

كَلْبٌ

ܟܠܒܐ (كلبو)

Dog

# Çavika Mizgîn

# عدسة مزكين



العدد - 197

مجاناً

# مزكين

15 - كانون الأول- 2025

